CDTFA

# FIROTIN LI KALÎFORNYAYÊ

California Department of Tax and Fee Administration
(Danasîna Wezareta Rêveberiya Bacê û Xercê Kalîforniyayê)



California Department of Tax and Fee Administration (Wezareta Rêveberiya Bacê û Xercê Kalîforniyayê, CDTFA) 37 bernameyên bac û xercê li Kalîforniyayê birêve dibe. Armanca me ew e ku em bi hilbijartina cihên erzan û bibandor ên ku piştgirî didin xizmeta giştî ya ku em hewce ne, jiyanê li Kalîforniyayê çêtir bikin. Em bixêrhatina we û pîşeyê we yê nû dikîn. Parêzgeha me di warê afirandina kar û veberhênanên serkeftî de xwedî dîrokeke dewlemend e û em ji we re heman serkeftinê dixwazin. Ev weşan wekî rêbernameyeke bilez kar dike ku hin hewcedariyên qanûnîyên ku hebin dema ku tiştek li Kalîfornyayê bifroşin nîşanî we bide. Rêzikên xebatê yên parêzgehê û qanûnên bacê gelek in û ev ne rêbernameyeke giştgir e. Em li vir in ku bersiva pirsên we yên têkildarî bacê bidin. Gekek xebatkarên me bi zimanekî ji bilî îngilîzî diaxivin û em ê bi daxwazeke ji pêş ve, em ê hewl bidin da ku piştrast bin kesek hebe bi zimanê we biaxive ku ji we re bibe alîkar.

## Destûra Firoşkarî ya Kalîfornyayê

Destûra firoşkarî ya Kalîforniyayê rê dide we ku tiştan di asta firoşgehekê yan firotana giştî de bifroşin. Piştî ku we bi me re qeyd kir, hûn dikarin destûreke firoşkarî wergirin. Bi gelemperî, ji bo ku hûn bi qanûnî karsaziyê bikin û/yan erebeyan, yan tiştên din li Kalîfornyayê bifiroşin, divê hûn destûreke firoşkarî wergirin. Egerji 90 rojan pirtir tiştekî nefiroşin, divê hûn destûre firoşkarî ya demkî bistînin, wekî ku ev pir caran ji bo dara Krîsmisê yan firotana berhemên hunerî diqewime.



## Destûra firoşkarî beramberî belgeya dîsa firotanê

Destûra firoşkarî û belgeya dîsa firotanê du tiştên cûda ne. Destûra firoşkarî rê dide hûn li Kalîfornyayê kelmel bifiroşin, lê belgeya dîsa firotanê rê dide tiştên ku hûn bêyî dayîna bacê ji dabînkerên xwe bikirin. Piştî ku hûn belgeya firoşkarî werdigirin, hûn dikarin belgeyên dîsa firotanê ji bo kirînên ku hûn ê di pêvajoya asayî ya pîşeyî de bifiroşin bidin dabînkerên xwe. Destûra firoşkarî ne *destûra kirînê ye.* Hûn dîsan jî neçar in ku li ser her tiştê ku bikar tînin, ji bilî firotanê, pîşeyê xwe (wek îmkanyata nivîsgehê) bac bidin.

## Daxwaza destûra firoşkarî

Daxwaz ji bo destûra firoşkarî belaş e. Hûn dikarin bi *serdana beşa a online*li ser malpera me ya li ser www.cdtfa.ca.gov daxwaza destûra firoşkarî bikin. Ji bo temamkirina daxwaza xwe, divê hûn di derheqê pîşeyê xwe de, wekî hûrgiliyên hesabê bankê û hatina texmînkirî, agahdariyan bidin. Eger we karsazî kirî, divê hûn navê xwediyê berê û hejmara destûra firoşkarî ya CDTFA dabîn bikin. Eger pêdiviya we bi rênîşandinê hebe, ji kerema xwe bi Navenda Xizmeta Mişteriyan re bi 1-800-400-7115 (CRS: 711) têlefon bikin û nûnerekî CDTFA dê kêfxweş bibe ku alîkariyê bike. Piştî ku we daxwaza xwe bi elektronîkî temam û radest kir, dûv re hûn dikarin destûra firoşkarî ya xwe çap bikin da ku li cihê xebata xwe nîşan bidin. Herwisa hûn dikarin bi serê xwe daxwaza destûreke firoşkarî bikin û biçin nivîsgeha xaneya CDTFA ya herêmî. Hûn dikarin hejmarên têlefon û navnîşanên nivîsgehê li ser malpera me bibînin *www.cdtfa.ca.gov/office-locations.*

## Daxwaza bo zelalkirina bacê

Ji bo ku hûn xwe ji neçariya dayîna baca bo firotanê yan karanînê ya pîşeyeke ku dikirin biparêzin, divê hûn ji me re binivîsin ku ji me re delîlên erêkirina bacê bixwazin. Divê di daxwaza we ya nivîskî de ev hebin:

- Nav, navnîşan, hejmara têlefona kesê dikire.
- Nav, navnîş û hejmara têlefona firoşkarî.
- Navnîşana pîşeyê.
- Kopiyeke meqbûza peymana firotanê yan kirînê bi qasa bihayê kirînê.
- Navê şîrketa belgespartinê û eger hebe, hejmara pêbaweriyê.
- Roja kirîna pîşeyê.

## Mercên xwedaniya destûra firoşkaran

Dema ku we destûreke firoşkarî hebe, divê hûn:

- Fêm bikin ka çawa qanûna baca firotan û bikaranînê li kiryarên pîşeya we digirin.
- Qeydên guncan ên ku firotan û kirînên we nîşan didin xwedî bikin (li jêr binêrin *Xwedîkirina Qeydan* ).
- Firotina carinan û vegera baca bikaranînê bi online bi me re tomar bikin. Piştî ku hûn qeydkirina destûra xwe ya online temam bikin, dê li gorî firotana texmînkirî nexşeyeke qeydkirina mehane, demsalî yan salane bidin we.
- Her baca firotanê yan bikaranînê ya ser kirîn û firotana xwe di wextê de bidin.

## Xwedîkirina Qeydan

Divê hûn qeydan biparêzin da ku bi kêmî ve çar salên dawîn mîqdara bacê rast nîşan bidin. Mînakên tomarên divê xwedî bikin ev bin:

- Pirtûkên hesaban ku kurteya dahat û lêçûnên wekî daxuyaniyeke gelemperî û rojnameyeke tê de hene. Ev agahdarî dikare bi elektronîkî were hilanîn.
- Qeydên resen ku piştgiriya diravdanên di hesaban de dikin, wekî meqbûz, reçete, nîşan, fermanên kar, peyman û belgeyên din.
- Belge û xebatnameyên ku ji bo amadekirina daxuyanên bacê tên bikaranîn.
- Belgeyên firotanê ku we ji mişteriyan wergirtin.

## Tomarên we divê van jî nîşan bidin:

- Meqbûzên giştî ji hemû dahata pîşeyê, wekî firotan û kirêkirina kelmel û dahata ku hûn dikarin ji bacê bêpar bihesibînin.
- Hemî kêmkirinên xwestî li ser vegera baca we.
- Bihayê giştî yê kirîna hemî tiştên kirînê

## Pêdiviyên Din bo Pîşeyê We

Ji bilî qeydkirina bo destûra firoşkarî, renge divê hûn ji bo bernameyên din ên bac û xercêyên ku em îdare dikin jî qeyd bikin (wekî, Xercê Tekereyan li Kalîforniyayê, Xerca Vezivirandina Bermayên Elektronîkî yan Bernameya Destûra Titun û cixareyê. Herwisa renge divê hûn micewiz, destûr û belgeyên din bistînin da ku pîşeyê xwe bimeşînin. Malpera CalGold, *www.calgold.ca.gov*, ev cîhek girîng e ku hûn dest bi peydakirina agahdariya lîsansê ya guncan ji bo pîşeya xwe bikin. Odeyên Bazirganiyê, rêxistinên pêşveçûna aborî, û rêxistinên pîşeyî jî çavkaniyên baş ên agahdariyê ne. Gelek caran beşa perwerdehiya pîşeyî ya bajêr yan parêzgehê jî dikarin alîkariyê bikin, yan jî hûn dikarin bo alîkariyê bi me re têkilî dayînin.

## Parêzera Mafên Bacdayîyan

Wek bacdayîyekî Kalîforniyayê, hin mafên we hene, wek mafê nepenîtiyê, mafê muameleya adilane, û mafê vekolîna çalakiyên ku em dikin. Eger ji bo çareserkirina fikaran bi riya kanalên asayî yên li CDTFA hewcedariya we bi alîkariyê hebe, yan jî hûn dixwazin di bin her yek ji bernameyên bacê yan lêçûnên ku em îdare dikin de ser mafên xwe bêtir bizanin, dikarin bi me re têkilî dayînin Nivîsgeha Parêzgerê Mafên Bacdayîyan têlefona belaş 1-888-324-2798

## Bo agahiyên pirtir

Bo alîkariya wergêrê devkî, ji kerema xwe bi nivîsgeha CDTFA ya herêmî re têkilî dayînin. Eger bixwazin, dikarin wergêrê xwe bi xwe re bibînin. Em ê her tiştî bikin ku bi we re baş û zelal têkilî dayînin. Eger pêşniyarên we hebin em çawa dikarin xizmetên xwe baştir bikin, ji kerema xwe me agahdar bikin.

Ev belavok bi kurtî qanûn û rêzikên ku di dema nivîsîna pirtûkê de derbas dibin vedibêje. Lêbelê, dibe ku ev qanûn û rêzikname ji hingê ve hatibin guhertin. Eger di navbera nivîsa vê pirtûkê û qanûnê de nakokî û pirsgirêk hebin, biryar li gorî qanûnê ye û ne li gorî vê weşanê ye.

